**Hallo Basel-Stadt**

Kanton Basel-Stadt

# Xwendegeh û perwerde

Sazûmana perwerdeyê
Xwendegeha mecbûrî
Perwerdeya pîşeyî / Xwendegehên navîn
Zanîngeh / xwendegehên bilind ên beşan
Fermîkirina dîplomayê

# Sazûmana perwerdeyê

Li Swîsreyê mirov dikare her dem hin tiştan hîn bibe û xwe wek kesane bi pêş de bibe. Bidawîanîna xwendina ji bo pîşeyekî bi taybetî girîng e. Kî xwendina xwe ya pîşeyî bi dawî bîne, ew dikare piştre li ser vê xwendinê bidomîne yan jî li xwendegeheke bilind bixwîne.

## Avahî / Berpirsyarî

Li Swîsreyê sê astên perwerdeyê yên li ser hev tên avakirin hene.

- Xwendegeha mecbûrî (Volksschule: Kindergarten, Primarschule und Sekundarstufe I)
- Perwerdeya bingehîn a pîşeyî yan jî xwendegeha navîn (Sekundarstufe II)
- Xwendegehên beşê yên bilind / zanîngeh û perwerdeya bilindtirîn a pîşeyî (Tertiärstufe)

Saziyên giştî yên fermî li ser bidawîkirina xwendinê radiwestin: Konfedere, kanton û şaredarî erk û berpirsyariyan par ve dikin. Ji ber vê yekê li kantonan xwendegeh û sazûmanên xwendegehan ên cihêreng hene.

## Xwendina mecbûrî

Li kantona Basel-Stadt xwendegeha mecbûrî 11 salan didome. Ev tê vê wateyê: Divê zarok seranseriya 11 salan herin xwendegehê. Gava zarok bibe 4 salî dema xwendegehê dest pê dike. Gava zaroka we nikaribe here xwendegehê, divê hûn vê yekê bi lêborîn ragihînin xwendegehê. Gava zarok bê agahî û bê lêborîn neyên xwendegehê, dêûbav dikarin werin cezakirin.
Zarokên temenê wan heta 16 salî yên nû hatine Baselê, dikarin biçin xwendegeha mecbûrî. Ciwanên ji 16 salan mezintir ên nû hatine Baselê, dikarin biçin Navenda Agahdariya Pîşeyî (Berufsinformationszentrum, BIZ). BIZ agahiyê dide wan, bê ciwan dikarin kîjan pîşe û xwendinê bikin.

## Perwerdehiya piştî xwendegeha mecbûrî

Piştî xwendegeha mecbûrî ciwan perwerdeya xwe bi dawî tînin. Gelek ciwan ji bo perwerdeyeke bingehîn a pîşeyî biryara xwe didin. (Perwerdeya pîşeyî, Berufslehre) Bi vê yekê re ew dikarin piştre xwendineke pîşeyî ya bilindtir bikin (höhere Berufsbildung). Ciwan dikarin di dema xwendinê de yan paş xwendinê matûra pîşeyî (Berufsmaturität) bixwînin. Bi vê yekê ew dikarin piştre biçin xwendegeheke bilind a beşê (Fachhochschule). Hema hema ji sedî 20ê ciwanan matûrayeke lîseyê (matûra lîseyê, gymnasiale Maturität) dikin. Bi vê yekê, ciwan dikarin li zanîngehê bixwînin.

## Alîkarî / Bûrs

Ji bo kesên kêmpere alîkarî (Stipendien) tê dayîn, ji bo karibin xwendina xwe bi pêşdetir bibin û xwendina pîşeyî bi dawî bikin. Wê demê piştî xwendina mecbûrî pere ji bo bidawîkirina xwendinê tê dayîn. Ger hûn ji welatekî din jî hatibin û li Basel-Stadt rûdinin, dibe ku hûn alîkariyekê bistînin. Lê ev yek girêdayî, welatê hûn jê hatine û demdirêjiya jiyana we ya li Swîsreyê ye. Saziya alîkariya diravî ya ji bo xwendinê dide (Amt für Ausbildungsbeiträge) ya rêvebiriya kantonan agahiyên zêdetir dide.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/schule-und-bildung/bildungssystem

# Xwendegeha mecbûrî

Li xwendegehên mecbûrî zarok xwendina bingehîn dibînin. Piştre ew dikarin perwerdeyên din bi dawî bînin. Xwendegehên dewletê belaş in.

## Qeydkirina zarokê

Ji birêvebirina xwendegehên dewletê şaredarî yan jî kanton berpirsyar in.
Zarokên xwe li vê derê bidin qeydkirin:
Qeydkirina ji bo baxçeyê zarokan an jî xwendegeha seretayî

- Ji bo zarokên li Basel-Stadtê: Xwendegehên gel ên Basel-Stadtê
- Ji bo zarokên li Riehenê: Xwendegeha şaredariya Riehenê
- Ji bo zarokên li Bettingenê: Xwendegeha şaredariya Bettingenê

Qeydkirina ji bo xwendegeha navîn:

- Xwendegehên gel ên Basel-Stadtê

## Astên xwendegehê

Sê astên xwendegeha pêwîst hene. Ast li ser hev tên lêkirin.

- Bexçeyê zarokan (Kindergarten) 2 salan didome.
- Xwendegeha seretayî. (Primarschule) 6 salan didome. Pêdiviya zaroka we bi alîkariya taybetî heye yan jêhatiniyên xwe yên taybetî hene? Wê demê alîkariya li gorî wê/wî li vir tê dayîn.
- Asta jorîn (Sekundarstufe I) 3 salan didome. Li asta jorîn sê cureyên xwendegehê hene (A-Zug, E-Zug, P-Zug) Zehmetiyên cureyên xwendegehê cihêreng in.
- Almanî ne zimanê dayikê yê zaroka we ye? Wê demê ew di her sê astan de jî alîkariya taybetî distîne.

## Hîndekariya Ziman û Çanda Welêt (ZÇW - HSK)

Zarokên we dikarin li kêleka xwendegeha pêwîst biçin kursên ziman û çanda welêt (Heimatliche Sprache und Kultur, HSK) Zarok zimanê welatê jê hatine hîn dibin. Wê demê, ew dikarin ziman çêtir fêhm bikin, biaxivin, bixwînin û binivîsin. Û ew hinek tişt li ser dîrok, erdnîgarî, cejn û kevneşopiyên ji welatê xwe hîn dibin. Em tevlêbûna kursan pêşniyar dikin. Kurs bi dildarî ne û bi piranî, divê hinek pere were dayîn.

## Xwendegeha dewletê /xwendegeha taybetî

Xwendegehên dewletê belaş in. Keç û kur bi hev re tev li perwerdeyê dibin. Hîndekarî ji aliyê olî (mezhebî) ve bêalî ne. Piraniya zarok û ciwanan (ji sedî 95) di dema xwendina mecbûrî de diçin xwendegeheke dewletê. Lê xwendegehên taybetî jî hene. Gava hûn zaroka xwe bişînin xwendegeheke taybetî, divê hûn bi xwe lêçûna xwendegehê bidin.

## Maf û berpirsyariyên dêûbavan

Divê xwendegeh we agahdar bike, bê zaroka we li xwendegehê çi dike û ew li xwendegehê çendî baş e. Ji ber vê yekê bi we û bi mamoste re axavtin tên kirin. Ji bilî vê êvarên civîna dêûbavan, yên mamoste li polê agahiyê didin hemû dayik û bavan, hene. Û çalakiyên bi agahiyên li ser xwendegehê, hene. Gava zaroka we diçe xwendegehê, divê hûn tev li van civîn û çalakiyan bibin. Hûn ji hatina zaroka xwe ya bi awayekî rêkûpêk a xwendegehê jî berpirsyar in.
Dibe ku zaroka we carekê wek mînak ji ber nexweşiyê, nikaribe were xwendegehê. Wê demê, divê hûn xwendegehê agahdar bikin. Divê hûn li ser rawestin, ku zaroka we karê xwe yê malê jî çêke. Hûn dikarin alîkariya zaroka xwe bikin. Wek mînak, hûn dikarin bipirsin, bê wê/wî li xwendegehê çi kiriye. Û hûn dikarin bi awayekî rêkûpêk li karê malê binêrin. Bi vê yekê hûn nîşan didin, ku bala we li ser e.
Gava hûn sazûmana perwerdeyê ya Swîsreyê hîn baş nas nakin, hûn dikarin di çalakiyekê de xwe li ser vê yekê agahdar bikin. Ji bo mirovên nû hatine Swîsreyê çalakiyên agahdarkirinê yên taybet hene. Ji ber vê yekê ev çalakî carina bi zimanên din ên derveyî almanî jî çêdibin.

## Pirs / Alîkarî

Gava pirsên we yên li ser xwendegehê hebin, divê hûn destpêkê bi mamoste re biaxivin. Gava pêdiviya we bi alîkariyê hebe, mamoste ji bo we jî li wir e. Dibe ku mamoste hest pê dike, pêdiviya zaroka we bi hin tiştan heye. Yan jî pirseke mamoste li ser zaroka we heye. Wê demê ewê destpêkê bi we re biaxive. Xebata bi hev re ya mamoste û dêûbavan pir girîng e.
Dibe ku pirsgirêkên derûnî (nefsî) û civakî yên zaroka we hebin. Xizmeta derûnî ya xwendegehê (Schulpsychologischer Dienst) alîkariya we û zaroka we dike. Ev alîkarî belaş e.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/schule-und-bildung/obligatorische-schule

# Perwerdeya pîşeyî / Xwendegehên navîn

Piştî xwendegeha mecbûrî piraniya ciwanan xwendina pîşeyî dikin. Gava hûn dixwazin li xwendegeheke bilind bixwînin, pêdiviya we bi matûrayê heye. Hûn dikarin matûrayê li xwendegeheke navîn bikin. Hûn dikarin matûrayê di dema xwendina xwe ya pîşeyî de jî bikin.

## Wateya bidawîanîna xwendinê

Perwerdeyeke baş a xwendinê û bidestxistina pîşeyekî baş li Swîsreyê pir girîng e. Bi xebateke baş a li xwendegehê piştre şansê we yê bidestxistina pîşeyî zêdetir dibe. Piştî xwendegeha mecbûrî derfetên we yên cihêreng ên hûn xwe ji bo jiyana pîşeyî amade bikin, hene (Sekundarstufe II). Hûnê bi xwendineke wirdetir karibin bi hêsanî ciyekî baş bidest bixin.
Pirsên we yên li ser bidawîkirin û domandina xwendinê hene? Şêwirmendiya pîşeyî, ya xwendinê û ya kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) bi ciwan û dêûbavan re dide û distîne. Şêwirmendî belaş e.

## Xwendina bingehîn a pîşeyî

Piraniya ciwanan piştî xwendegeha mecbûrî xwendineke bingehîn a pîşeyî dikin (xwendina pîşeyî, Berufslehre) Di xwendineke pîşeyî de, hûn li ciyekî kar dikin. Hûn li wê derê hînî jêhatiniyên pratîkî yên ji bo pîşeyê we ji we re lazim in, dibin. Hûn pê re diçin xwendegeha pîşeyî. Hûn dikarin ji bo zêdetirî 250 pîşeyî xwendineke pîşeyî bikin. Xwendineke pîşeyî ji 2 heta 4 salan didome. Divê hûn di her du salên dawî de, bi xwe li ciyekî hînbûna kar li ba fîrmayekê bigerin. Xwendegeh ji bo vê yekê alîkariya we dike. Lê belê, divê dêûbavê we jî hevkarî û alîkariyê bikin. Li ba şêwirmendiya pîşe, xwendin û kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) gelek derfetên cihêreng û şêwirmendiyê ji bo ciwanan hene. Şêwirmendî belaş e. Hûn dikarin di dema xwendina xwe ya pîşeyî de yan piştî wê matûrayeke pîşeyî jî bikin (Berufsmaturität) Bi vê yekê, hûn dikarin li xwendegeheke bilind a beşeke teknîkî/hunerî bixwînin.

## Xwendegehên navîn

Xwendegehên navîn (Mittelschulen) mirovan ji bo xwendina li zanîngehekê yan li xwendegeheke bilind a beşeke teknîkî (Fachhochschule) amade dikin. Li xwendegeha navîn xwendekar perwerdeyeke berfireh a giştî dibînin.
Gelek cureyên xwendegehên navîn hene:

- Xwendegehên navîn ên bi lîseya matûrayî: Hûn dikarin piştre li zanîngehekê xwendina xwe bidomînin. Hûn dikarin li xwendegeheke bilind a beşên teknîkî jî bixwînin
- Xwendegehên navîn ên bi matûraya beşên teknîkî yan bi matûraya pîşeyî. Hûn dikarin piştre li xwendegeheke bilind a beşên teknîkî bixwînin. Dibe ku hûn karibin li zanîngehekê jî bixwînin. Lê ji bo vê yekê, divê hûn ezmûnekê derbas bikin. Carina tiştên din jî ji mirov dixwazin.

## Derfetên derbasekê

Hûn di temenê navbera 18 heta 25 salî de ne û hûn hema piştî dema xwendegeha mecbûrî hatine kantona Basel-Stadtê. Wê demê dibe ku hûn karibin tev li derfeteke Navenda ji bo derfetên derbasekê, bibin (Brückenangebote, ZBA) Li wê derê, ji bo hûn destpêkirineke baş a jiyana kar bikin, derfet hene. Ev derfetên derbasekê alîkariya we dikin, ku hûn ciyekî pratîkê yan ciyekî hînbûna kar bibînin. Bala we dikişîne? Wê demê serî li Navenda ji bo derfetên derbasekê bidin (Zentrum für Brückenangebote).

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/schule-und-bildung/berufsbildung--mittelschulen

# Zanîngeh / xwendegehên bilind ên beşan

Swîsre 2 cureyên xwendegehên bilind nas dike. Zanîngeh û xwendegehên bilind ên beşên teknîkî. Ji bo pejirandina dîplomeyên matûrayî yên ji derveyî welêt, divê mirov rasterast serî li xwendegeha bilind bide.

## Sazûmana xwendegeha bilind

Mirov xwendegehên bilind ên Swîsreyî wek zanîngeh û wek xwendegehên bilind ên beşan (Fachhochschulen) ji hev cuda dike. Li xwendegehên bilind ên beşan zêdetir perwerde bi awayê pratîkî, li zanîngehan jî zêdetir bi awayê teorî ye. Her du cureyên xwendegehan wek hev in û li gor sazûmana Bologna ya ewropî hatine sazkirin. Hûnê van xwendegehan bi lîsansekê yan bi lîsanseke bilind (master), ku li gor pîvanên ewropî fermî tê nasîn, bi dawî bînin.

## Destûrdan

Li gor her xwendegeha bilind şertûmercên cuda yên destûrdanê hene. Bi bawernameya matûra ya Swîsreyê têketina xwendegeha bilind tê garantîkirin. Bidawîanînên matûrayên derveyî welêt di her rewşê de nayên pejirandin. Ji bo destûrdana destpêkirina xwendinekê, divê mirov serî rasterast li xwendegeheke bilind (zanîngeh/xwendegeha bilind a beşan) a mirov dixwaze lê bixwîne, bide. Bi gelemperî hewceyî bi asteke herî baş a zanîna almanî heye. Hin kursên bi tevayî bi ingilîzî tên dayîn, derveyî vê yekê ne. Şêwirmendiya pîşe, xwendin û kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) bê pere agahiyên li ser derfetên cihêreng ên asta sêyem dide.

## Xwendina pîşeyî ya bilindtir

Li kêleka xwendegehên bilind li Swîsreyê xwendina pîşeyî ya bilindir jî riyeke tê hezkirin a xwendina bipêşdetir e. Ew derfetê dide kesên beşên pîşeyî, ku taybetîkirinek û kûrkirinekê li ser beşa pîşeyê xwe bikin û bi vê yekê karibin erka birêvebiriyê bigirin ser xwe. Xwendina pîşeyî ya bilind girêdayî xwendina bingehîn a pîşeyî ye (hînbûna pîşeyî, Berufslehre). Ji bo vê yekê pêdivî bi matûrayê tine ye. Şêwirmendiya pîşe, xwendin û kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) bê pere agahiyan li ser derfetên cihêreng dide.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/schule-und-bildung/universitaeten--fachhochschulen

# Fermîkirina dîplomayê

Dîploma û bawernameyên ji derveyî welêt li Swîsreyê her dem derbas nabin. Lê belê di bin hin şertûmercan de dibe ku dîploma were fermîkirin. Ji bo hinek pîşeyan ev yek pêwîst e.

## Fermîkirin

Kesên xwediyê dîplomeyeke ji welatên biyanî ne, dikarin wan di bin hin şertan de li swîsreyê bidin fermîkirin. Bi fermîkirinê, wê were erêkirin, ku dîplomeyeke ji welatê biyanî yan jî bawernameyeke ji welatê biyanî bi dîplome yan bawernameyeke Swîsreyê re hevnirx e. Ji bo hin pîşeyên birêkûpêkiyê dixwazin (wek mînak pîşeyê hemşîretiyê, mamosteyî û hwv.) ji bo karibin pîşeyê xwe bikin, pêdivî bi fermîkirinê heye. Ji bo fermîkirinê li gor her pîşeyî yan her bawernameyê ciyên cuda berpirsyar in. Buhayê fermîkirinê heye. Ciyê Têkiliya Neteweyî ya Fermîkirina Dîplomeyê yan jî Şêwirmendiya Pîşe, Xwendin û Kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) agahiyan didin.

## Erêkirina astê

Di warê pîşeyên ne girêdayî biserûberkirinê de, ji bo li Swîsreyê kar bikin, pêdivî bi fermîkirina dîplome yan bawernameyan tine ye. Ji bo van pîşeyan dikare erêkirina astê (Niveaubestätigung) were xwestin. Ev jî nirxê ciyê dîplomeya biyanî ya di nav sazûmana perwerdehiya Swîsreyê de nîşan dike. Erêkirin dikare di dema lêgerîna ciyê kar de alîkariyê bide. Agahiyên ji bo erêkirina astê Ciyê Têkiliya Netewî ya ji bo Naskirina Dîplomeyan (Nationale Kontaktstelle für Diplomanerkennung) an jî Şêwirmendiya Pîşe, Xwendin û Kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) par ve dikin.

## Dubarekirina xwendina pîşeyî

Kesên mezin ên xwedîtecrubeya pîşeyî lê bê dîplomayek an bawernameyeke hatiye nasîn, dikarin li Swîsreyê xwendineke perwerdeya bingehîn a pîşeyî_yan jî perwerdeya pîşeyî ya bilind_cardin bistînin. Pêvajo, girêdayî xwendina berê hatiye kirin, tecrubeya pîşeyî û temen e. Di her rewşê de asteke baş a zanîna almanî şertekî bingehîn e (Asta B1/B2 li gorî GER). Kesên bixwazin, dikarin li ba şêwirmendiya pîşe, xwendin û kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) bê pere agahî û şêwirmendiyê bistînin. Kî perwerdeyeke pîşeyî cardin bidest bixe, şansê xwe yê di bazara kar û têketina perwerdeyên pêşdetir de çêtir dike.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/schule-und-bildung/diplomanerkennung